

WÊJEYA KURDÎ û BÎR

Di dîroka wêjeya hemû zimanan de, afirandinên wêjeyî bi tevlêbûyina du kirdêyên cuda ve pêk tên¹. Yek ji wan kirdeyan civak e, bi wateya xwe ya giştî ve, û endamên wê civakê jî kirdeya duyem pêk tînin û bi xebateke hevpar ve dibin afirînerên wêjeya wî zimanê ku di nava wê civakê de dijî.

Di wêjeya civakê de berî her tiştî bîreke giştî heye. Ew *bîra giştî* bi guhêrîna mirov re, bi bûyerên çandî, civakî, xwezayî, siyasî an jî takekesî ve tê dewlemendkirin. Civak çawa kesan ava bike, kes jî bandora xwe li wê dîkin. Ev dewlemendkirina dualî jî xwe ber pêk tê û temenê wê civakê çiqasî pirr be, bîra wê jî ewqasî dewlemend dibe. Bê gûman, têkiliyên wê civakê yên bi cîranên wê re û bi bîra cîranên wê re jî dibin beşekî çavkaniyên bîra wê.

Bîra civakê, her weha dîroka wê ye jî ; lê belê, *bîr* bi dîrokê bi tenê nayê avakirin. Xwezî û hêviyên wê civakê jî, digel bîr û bawerî û adetên wê yên heyî, rengê wê bîrê diyar dîkin. Lewre *bîr* her weha berê xwe dide siberojê jî.

Mirov, bi awayekî xwezayî tim bi serboriyên xwe re dijî û rabirdûya xwe bi xwe re tîne. Ji ber ku mirov dixwaze dema xwe ya nuha tim şîrove bike û dema bihurî jî rave bike, bûyerên rabirdûyê û yên nuha dibin bingehê zimanê wî, çanda wî, dîroka wî, xewnên wî, yanî *bîra wî*. Lê belê, mirov bi tenê bi rabirdû û nuhaya xwe ve najî, mirov tim hewl dide ku fikrekê jî xwe re li ser siberoja xwe jî çêbike; yanî, mirov serboriyên xwe vedibêje, li ser rewşa xwe difikire, lê her weha berê wî li sibêrojê yê jî. Ew cîhana wî ya ku li ser *do*, *îroj* û *sibehê* ava dibe û di serborî û tirs û xeyalan re derbas dibe, navenda hemû jiyana wî ye, angu *kakilê bîra wî* ye.

Gava ku em dibêjin "*berhema civakê*" an jî "*berhema civakî*", em dizanin ku di vê binavkirinê de hesabê wan hemû alavan hatiye kirin ku me li jorê behsa wan kir. Berhemeke wêjeyî, ne bi tenê bi pirtûkan e û ne mecbûr e ku were çapkirin jî. Lewre gellek awayên afirandina jî vê bîra civakî hene. Mirovahiyê bi wêneyên ser dîwarên şikeftan ve yekem berhemên bîra xwe qeyd kirine û gihandine heta dema me, lê ji wê çaxê û heta nuha, rêyên derbirinê yên mîna nivîsên li ser tabletan, mîmarî, ol û bawermendî û hê bi dû re berhemên zimanê nivîskî hatine peydakirin.

Derbirîn an jî vegotin di xwezaya mirov de heye; mirov birçiyê peyvê ye. Bi her berhemeke xwe ve mirovahî vê çalakiya derbirîn û vegotinê dewam dike. Hingê hemû berhemên ku heta îroj em bi hebûna wan ve hisiyane, çi nivîs, çi gotin, çi muzîk, çi mîmarî, çi çandî an jî çi wêjeyî bin, berhemên wê çalakiya hevpar in. Erê, yên ku wê çalakiyê dîkin, şexs in, kes in, takekes in, lê belê him çavkaniya xwe jî bîra giştî ya civakê distînin û him jî bi çalakiyeke şexsî ve, di ser bîra xwe ya şexsî re dibin beşek ji bîra giştî û wê bîrê dewlemend dîkin. Angu, her du bîr di nava hev de, bi hev re û bi bandora hev ve dijî. Lê belê, ew bîr ji kana *bîra mirovahiyê ya giştî*, jî *bîra gerdûnî* jî vedixwin. Hingê, çalakiya bîrê yek alî nîne, girtî û bisinorkirî jî nîne û gava ku em dibêjin *bîra giştî*, di eslê xwe de em *bîra civakî*, *bîra neteweyî*, *bîra welatî* û her weha *bîra gerdûnî* jî tev lê dîkin ; *bîra şexsî* bi van hemû bîran, di nava wan de, li ser wan, bi wan û ji wan ava bûye. Wêje bi xwe jî berhemeke wê çalakiya hevpar ya her du bîran e ku bandorê li hev dîkin. Hingê, tiştêk ji xwe ber ava nebûye.

Li gorî wê çalakiya ku me li jorê behs kir, *bîra giştî-şexsî* berhemên xwe yên wêjeyî li ser berhemên xwe yên berê ava dike. Ew berhemdarî bi rêya peyvên pêşyan, biwêj, metelok, çîrok, sitran û destanan ve diyar dibe. Ew berhemên *bîra giştî-şexsî* dîsa weke alavên dewlemendiya bîrê tev li wê dibin û dibin malê her kesî. Ji ber wê ye ku xwediyê biwêjekê an jî peyveke pêşyan an jî destaneke weke *Memê Alan* nikare bi zelalî were diyarkirin. Em ji wan berheman re ku malê her kesî ne û berhema her kesî ne, dibêjin "*berhemên wêjeya gelêrî*" an jî yên *wêjeya devkî*. Ew berhem dikarin bi demê re biguherin jî û weke xwe jî bimînin. Lewre tecrubeya civakê dikare bandora xwe li berhemên berê jî bike û wan adapteyî xwe bike.

¹ Ev gotar ji ber notên derseke nivîskêr hatiye amadekirin ku nivîskar ji bo berhevkirina wan notan spasdarî şagirtê xwe Mûsa Ekîcî ye.

Ji bo dîtina vê çalakiya guherînê, mirov dikare bala xwe bide hin berhemên ku ji aliyê civakê ve baş tîn naskirin. Em bibêjin weke mînak *Memê Alan, Derwêşê Evdî, Siyabendê Silîvî, Cembeliyê kurê Mîrê Hekariyan* û hwd. Ev destanên kurdî, îroj li gellek deveran û bi gellek varyantan ve tîn gotin û hin ji wan hatine çapkirin jî, da ku mirov bikare cudahiyên varyantên wan bibîne. Heger mirov bi dema qeyda van berheman bizane, mirov dikare wan bi hêsanî bide ber hev jî. Destana *Memê Alan* îroj vê derfetê dide me û em ê bi rêya wê ve hewl bidin ku çalakiya guherîna di ser heman berhemê re baştir were dîtin.

Em dikarin versiyonên vê çîroka êvîna Memî û Zînê li gorî qeydên demên wan yê cuda nas bikin. Di sedsala 17'an de Ehmedê Xanî, di sedsala 19'an de Melle Mehmûdê Bayezidî û di sedsala 20'an de Roger Lescot hewl dane ku vê çîrokê derbasî nivîsê bikin û her kê bi formeke cuda nivîsandiye. Îhtimal heye ku her yekî ji wan tiştek li gorî xwe lê zêde jî kiribe, tiştek guherîbe, an jî tiştek jê avêtibe. Weke ku Qanatê Kurdo bi xwe jî li ser 8 versiyonên *Mem û Zînê* kiriye, heger em bi tenê wan her sê versiyonan bidin ber hev, em ê bibînin ku ne bi tenê di şikl û forma xwe de, lê her weha di bûyerên çîrokê de jî û di taybetmendiyan lehengan de jî guherînen balkêş dê ber bi çavên me ve bikevin. Lê dîsa jî xetta sereke ya navenda çîrokê her weke xwe dimîne: *kurek ji keçekê hez dike, keç xwişka mîrî ye, lê ji ber ku fesadî dikeve nava çîroka wan, kur ji aliyê mîrî ve tê cezakirin û berxwedana kurî jî dibe sedem ku ew çîrok bigihîje heta îroj*. Lê ev çîrok, li gellek deveran û bi nuansên cuda ve tê gotin, digel ku navê lehengan weke xwe dimîne.

Hingê, em dizanin ku berhemeke giştî li gorî deman, li gorî cihan û li gorî kesan dikare were guhertin. Ji ber wê ye ku Memê lehengê vê çîrokê di hin versiyonan de *kurê mîrekî Mexrebî ye*, di hinan de *xwarzêyê Qureşiyîyan* e; lê di hin versiyonên din de *kurê Mîrekî Kurd* e. Ji nuha ve vaye sê taybetmendiyan Memî yê cuda bi destê me ve ketin ku agahiyên li ser wî yê bingehîn in. Belkî nasnameya Memî di demên kevn de ne ewqasî girîng bû, lê belê bi taybetî jî di versiyonên nû de ku temenê wan ne zêde ye, kurdbûna Memî weke guherîneke balkêş xuya dibe. Dibe ku Mem di eslê xwe de Mexrebî be û ne Kurd be jî, dibe ku ew welatê Mexrebê ku di destanê de behsa wî dibe bi tenê heremek be û li *mexrebê Cizîrê* be, yanî li rojavayê wê be jî û Mem bi xwe jî kurd be, em vê baş nizanin; lê belê, hûrgiliyan ku divê di nava vê çîrokê de bala me bikişînin, bi mirov didin fahmkirin ku *Mem kurd* e, ji ber ku di tu versiyonên vê çîrokê de nayê gotin ku Mem û Zîn bi *zimanên cuda* dipeyivin. Nezelaliya zimanê ku ew pê dipeyivin, di vira de me digihîne fikra ku her du bi heman zimanî dipeyivin û hingê ji heman welatî ne jî.

Hingê Mem jî kurd e û nîqaş li ser nîne. Ji xwe, yê ku ew pirs zelal kiriye û Mem ji Mexrebê aniye û kiriye kurd, Ehmedê Xanî ye. Divê were bibîrxistin ku berî Ehmedê Xanî, di nava civaka kurdî de pîrsa netewebûyîne ne ewqasî zelal bû, misilmanî û eşîrî berî nîrxên din bûn. Yê ku ne ji heman eşîrê bûna, ji hev re xerîb û biyanî bûn ku hê jî di nava civaka me de peyva *xerîb* an jî *biyanî* ji bo kesên ne ji heman malbatê tê bikaranîn. Her tişt divê li gorî dem û cîhê xwe were nîrxandin. Ka em bala xwe bidin çîrokê.

Piştî bûyera keçên pêriyan û hevnasîna Memî û Zînê ya di xewê² de ku di pîrraniya versiyonên wê destanê de heye, gava ku Mem dixwaze rêya welatê Zînê peyda bike, em fahm dikin ku her du welat an jî her du herem an jî her du bajar ji hevdu gellekî dûr in û li welatê Memî kes bi rêya Cizîra Botan nîzane. Lê piştî ku dide ser rêya rast û bi hespê xwe yê bi navê Bozê Rewan diçiyê, em dizanin ku zû digihîje Cizîra Botan. Di vira de taybetmendiyan hespê wî yê fantastîk jî girîng in. Lewre di hin versiyonên vê destanê de tê gotin ku Bozê Rewan "*rêya şêst rojan di şeş rojan de çûye*". Lê belê, nayê gotin ka gelo ew rê li gorî çî hatiye pîvandin. Ji ber ku tê gotin ku ew destan di sedsala 13'an de peyda bûye, mirov texmîn dike ku alavên veguheztinê yê lezgîn yê mîna dema me nebûn û hingê bi ihtimaleke mezîn behsa karwanan dibe. Hingê ew şêst rojên wê demê û şêst rojên dema me, ne mîna hev in. Li cem me, ew şêst roj belkî nekin çar saet jî. Em fahm dikin ku Bozê Rewan yê ku ji deryayê tê derxistin, welatan nêzik dike, lewre wekî din di vê çîrokê de tu bandoreke wî ya girîng tune. Orjîna wî û çîroka peydakirina wî jî vê taybetmendiya wî ya surrealîst temam dike û xurt dike.

² Li gellek deveran tê gotin ku Mem û Zîn di xewnê de hevdu nas dikin; lê, di eslê xwe de ew hevdu di xewnê de nas nakin. Ji ber ku keçên periyên dixwazin bizanin bê çiqasî li hevdu dikin, textên wan yê razanê tînin cem hev, da ku li wan temaşe bikin. Lê belê, sêhra wan xirab dibe û Mem û Zîn şiyar dibin û hevdu dibînin. Hingê, hevnasîna wan ne di dema xewnê de lê di dema şiyarbûnê de pêk hatiye, lê wan gotiye qey xewn e.

Li ser welatê Memî, agahiyeke din dikare alî me bike: di hin versiyonan de tê gotin ku bajarê ku Mem lê dijî li keleka Deryayê ye û gellek deriyên wî hene. Lê Kurd him ji heremên cuda re dibêjin *welat* û him jî ji golên mezin re dibêjin *derya*, weke *behra Wanê* ku di eslê xwe de gol e, lê li ser deryabûna wê sitran jî hene. Referansên ku di vira de hatine bikaranîn (weke *welat* û *derya*) li gorî deman û cîhan diguherin. Hingê, em dikarin bibêjin ku di çîrokê de diyarkirina cîhê welatê Memî ne hêsan e û kurdbûn an nekurbûna wî jî, di hin versiyonan de, ne zelal e; lê, weke ku me got, mijara zimanê ku Mem pê peywendiyê bi Zînê re datîne û nebûna agahiyên zelal wî ber bi *kurdbûnê* ve dibe; lê dîsa jî girîngiya kurdbûna wî li gorî demê diguhere. Hingê, bîr û baweriyên olî û siyasî bi ihtimaleke mezin bandora xwe li vê çîrokê jî kiriye. Ji ber ku ol an jî siyaseta li gorî demê dikarin biguherin, bandora wan jî dikare li gorî demê encamên cuda bide.

Di wêjeyên zimanên ewropî de, girîntirîn çalakiyên wêjeyî yên pêşîn veguheztina berhemên devkî yên ser nivîsê bûn. Bi vî awayî, wêjeya modern ku bingeheke wê çar sed sal berê hatine danîn, xwe dispêre ser çalakiyeke weha ku bi awayekî prîmîtîf di sedsala yanzdehan de dest pê kiribû, lê belê, piştî îcada çapxaneyê ya sedsala 15'an, li seranserê Ewropayê belav bûbû û bûbû yek ji cudahî û taybetmendiyên arîstokrasiyê. Em dibêjin "*arîstokrasi*" an jî "*elîta civakî-wêjeyî*", lewre wêjeya nivîskî di destpêkê de karê arîstokrasiyê bû. Ji ber wê ye ku heta ku sedsala 19'an ku asta xwendinê hêdî hêdî li nava civakê belav bû û wêjeya ji hegemonyaya arîstokratan derket, li Ewropayê nivîskar bi pirranî beg û paşa û keşiş bûn, ku ji xwe desthilatdar bûn.

Li Rojhilatê, çîna arîstokrasiyê wekî din tev digeriya. Siltan û paşayên qirna navîn, weke ku di destanên kurdî de jî tê gotin, tim dengbêj û helbestvan di civata xwe de vedihewandin û xatir dida wan. Ev piştigiriya ku desthilatdaran dida hunermendan (dengbêj û helbestvan) ew di nava civatê de jî bilind dikirin, lê belê ji ber mecbûriyeta debara ku di dîwanê de dihat avakirin, dengbêj û helbestvan dibûn xizmetkarê desthilatdariyê. Li hember Ewropaya ku nivîskarên wê ji nava desthilatdaran peyda dibûn, Rojhilateke weha hebû ku nivîskarên wê bêtir li ber deriyên paşa û began bûn; lewma jî bê guman divê mirov di warê azadiya hibrê de wan ji hev cuda bike. Ji ber wê ye ku kêm filozof di nava nivîskarên rojhilatî de derketine, digel ku li Ewropayê nivîskar berî her tiştî rewşenbîr bûn û li qeraxên felsefeyê digeriyan.

Cudahiyeyeke din ya di nava Rojava û Rojhilatê de ew bû ku derfetên çapkirin û belavkirinê jî dereng gihîştin Rojhilatê û gava ku mirov hesabê peywendiyê bi desthilatdariyê re jî bike, mirov nikare bifikire ku bandora edîbên rojhilatî li civakê bûye. Berhemên *destnivîsê* û yên *çapkirî* nikarin di warê pêşketina wêjeyî û civakî de mîna hevdu werin nirxandin. Li Rojhilatê, ji bilî dîwanên axa û paşa û began, li medrese û xwendîngehên din gellek kesên ku perwerdehiyeye giştî didîtin jî wêjeya nas dikir û berhem diafirandin. Lê belê, kêm berhemên wê "*dewra nezaniyê*" li nava civatê belav bûne û pirr kêm berhem ji yên belavbûyî jî heta îroj hatine parastin. Nimûneya herî baş ya vê çalakiyê jî dîsa *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî ye.

Xanî ew mesnewiya ku dibû arketîpa romana kurdî ya îroj li ser destana *Memê Alan* nivîsandiye ku ev destan, bi awayekî devkî û bi gellek versiyonên kêm zêde weke hev ve, li nava Kurdan belav bûye. Ev çîrok di eslê xwe de bi alavên mîtolojîk ve hatiye avakirin, weke peydakirina hespê Memî yê bi navê Bozê Rewan, weke çêbûna Memî bi xwe û weke hev naskirina her du evîndaran ya bi rêya keçên periyên ve. Ehmedê Xanî ew destan jî taybetmendiyên wê yên mîtolojîk paqîj kir û heta ku jê hat regekî rastiyê da çîroka evîna *Mem û Zînê*. Wêjeya divê xwe weke rastiyê bi xwendevanê xwe ve bide peyirandin an jî teqlîdeke rastiyê be, da ku bikeve serê mirov û baweriya mirov pê were. Heger ev bawerî nebe, bandora metnê jî dê cuda be. Xanî, pêdivî bi bikaranîna taybetmendiyên mîtolojîk ve nedîtiye, lewre ji bo ravekirina tiştên ku wî dixwast, pêdiviya wî bi çîrokeke rastîn ve hebû. Ji xwe, huner, û bi taybetî jî wêjeya, ji wira û bi şûn ve dest pê dike; yanî gava ku takekes mudaxaleyî berhemeke giştî bike û li ser wê, bi formeke şexsî û şewazeke şexsî û xeyal û tevneke şexsî ve, wê çîrokê jî nû ve biafirîne an jî çîrokeke din jê ava bike. Nivîskar heman çîrokê vê carê di rêya şexsê xwe re dîsa li civakê vedigerîne. Lewma jî, em çalakiya wêjeya romana kurdî dibin heta *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî ku tê de him şopên wêjeyê nû hene û him jî têgihîştineke nû ya wêjeyî û siyasî heye ku me jê re gotiye "*kurdaniya bîrewer*"³. Hingê "*bîra kurdî*" ya ku em ê di wêjeyê de behs bikin û ji

³ Ji bo agahiyên berfireh, li gotara nivîskêr ya bi navê "*Celadet Bedîrxan, çavkaniyên Hawarê û Kurdaniya Bîrewer*" binihere ku di kovara *Zendê* de hatiye belavkirin.

xwe re weke metod bigirin "*bîreke bîrewer*" e ku tê de xatirê "*kamili*" û "*kurdewarîbûnê*" bilind e. Ehmedê Xanî jî ji bo me di vî warî de nimûneya herî xurt e, herçend li cem Melayê Cizîrî jî mirov dikare hin nuansên berbiçav yê helwêstên wî bibîne jî. Ji xwe Xanî bi xwe jî di *Mem û Zînê* de xwe bi Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran û Elî Herîrî ve girê dide.

Piştî mînaka Ehmedê Xanî û xebata li ser *Mem û Zînê*, êdî peyva ku em ê binivîsin ji aliyê xwendevanên me ve baş hatiye fahmkirin: em wêjeya kurdî bi serê xwe ve nahesibînin û wê di sînorên coxrafîk de nanirxînin. Statu û erka berhema wêjeyî êdî guheriye. Wêjeya kurdî jî di nava wêjeyên zimanên din de û bi wan û li ser wan û ji wan ava dibe, lewre bîra wê êdî sînoran nas nake û, ji xwe, di vê dema me de bisînkirineke wêjeyî ya coxrafîk ancax safîkiyek e.